## Cîhekê zarokxanê bi çend pereyan e?

Li Norwêcê, hedê bilind ê bihayê cîhekê zarokxanê heye. Ev tê wê manayê ku zarokxane nikarin ji bihayê ku salane ji aliyê parlemanî ve tê destnîşankirin bêtir ji heqê dêûbavan bixwazin. Zêdebarî wê yekê tu wê pereyê xwarinê jî bidî. Ew lêçûn/xerc wê ji zarokxanekê heta zarokxaneke din hinekê biguhere.

Tu dikarî bihayê cîhê zarokxanê li vir bibînî: www.bergen.kommune.no/pris-barnehageplass.

Dibe malbatên kêm-meaş, mafê daşkandina heqê dêûbavan hebe.

Tu dikarî bêtir li ser wê yekê bixwînî: www.bergen.kommune.no/redusert-foreldrebetaling

## Zarokxaneyê hilbijêre û daxwaza cîhekî zarokxaneyê bike

Tu dikarî li vir daxwaza cîhekê zarokxaneyê bikî www.bergen.kommune.no/barnehageplass

Tu dikarî di appa daxwaznameyên dîjîtal de (bişkoka şîn) zarokxaneyan li nêzîkî cîhê ku tu lê dijî, bibînî.

Tu dikarî di vî rûpelî de nêrîneke giştî li ser hemû zarokxaneyan li Bergen wergirî: www.bergen.kommune.no/barnehager

Tu dikarî li ser vira daxwaza zarokxaneyan li devera xwe ya nêzîk bikî www.barnehagefakta.no bigerin.

### Erê jibo daxwazkirinê hewceya te bi alîkariyê heye?

Seredana Innbyggerservice li Kaigaten 4, beramberî Byparken bike, an jî telefona **55 56 55 56** bike. Heke te jimareya nasnameya Norwêcî nebe tu dikaræ li vira alîkariya daxwazkirinê jî bistînî.


© Kristin Hauge

*Innbyggerservice, Kaigaten 4.*

BERGEN KOMMUNE

Skipnes.no Svanemerket trykksak, 2041 0731 Foto forside: © Trude Haugen

KURDISK – KURMANJI

# Zarokxane – destpêkeke baş






## ZAROKXANE – destpêkeke baş

Zarokxane, çalakiyeke perwerdehiyê ye ku hewcedariyên zarokan jibo lênêrîn, leyîstin û hînbûnê bi stûyê xwe ve digire, û di pêvajoya hîndekariyê de gava yekem e. Piraniya zarokên di jiyê yek heya şeş saliyê de yên ku li Norwecê dijîn, diçin zarokxanê.

## ZAROKXANE – derfeteke perwerdehiyê bi hevkariyeke nêzik bi dêûbavan re

Hemû zarokxane, hem yên taybetî û hem jî yên şaredariyê, li pey qanûna zarokxanê diçin. Li zarokxanê mamosteyên zarokxanê bi kêmî xwedî sê sal hîndekariya zanîngehê ne tên erkdarkirin. Ev tê wê wateyê ku zarokê /-a te ji aliyê karmendên jêhatî û dilgerm, ên ku li ser zarokan xwediyên pir zanînê ne, tên çavdêrîkirin. Şopandina zarokî/-ê bi rêya têkiliyeke baş bi malê re pêk tê. Tu dikarî li ser tiştên ku tu meraq dikî bi karmendan re biaxivî, û peşnîyarên ku jibo dilxweşî û peşveçûna civakî ya zarokê/-a te alîkar bin, bikî. Têkiliya di navbera zarokxanê û malê de girîng e bi taybetî dema ku çandên cûda li hev dicivin.







## ZAROKXANE – cîheke jibo leyîstin, hînbûn û pêşveçûnê

- Li zarokxanê, zarokê te wê bi zarokên din re li jîngeheke civakî bimîne. Zarok wê çand, ziman û girîngiyên hevûdu nas bikin. Zarok wê bi rêya leyîstin û çalakiyan di tevkariya bi zarok û mezinên din re çalak û hîn dibe. Ji zarokî re heval çêdibin, jêhatiyên xwe civakî pêş dixe û dibe xwedî serpêhatî berî destpêkirina dibistanê ku ew di hemî warên pêşveçûnê de xurt dibe.
- Pêşveçûna zimanê zarokan li zarokxanê tê teşwîqkirin. Bi rêya leyîstin û lêgerîna bi zarokên din re, zarok li ser hizr, raman, hest û serpêhatiyên xwe kar dike. Bi vî rengî zarok zimanê xwe li zarokxanê pêş dixe.
- Zarok dikare di eynî demê de çendîn zimanan hîn bibe. Zarokxane wê tevî dêûbavan, hêsankariyê bikin ku zarok zimanê zikmakî û norwêcî jî hîn bibe - zimanê zikmakî li malê û norwêcî jî li zarokxanê.
- Hînbûna zimanekî dem pê divê. Lêkolîn nîşan dide ku hînbûna zimanekî bi rengekê baş salek heya sê sal jibo ku mirov bikare danûstandinê bi yên din re bike, û pênc heya heft sal jî jibo bikaranîna zimanekî di rewşên hînbûnê yên bêtir fermî de, weke xwendin û nivîsandinê, pê divên. Lewra destpêkirina zû ya zarokxanê jibo hînbûna norwêcî berî destpêkirina dibistanê ya girîng e.

## ZAROKXANE – derfetan dide dêûbavan

- Dema ku zarokê/-a te ji aliyê karmendên jêhatî û dilgerm li zarokxanê tên çavdêrîkirin, derfet ji te weke dêûbav re çêdibe ku tu bikarî dest bi kar yan xwendinekê bikî.

